



KMR

*"Min li Yekîtiya Ewropayê  
daxwaza penaberyê daye  
- çi welatek tê Li ser  
daxwaza penaberya  
min lêkolên biket?"*

A

Zanyarî ji bo daxwazkerên parastina navnetîyewî ku li qonaxa proseya Dublînê da ne, li gor madeya 4 ji destorên (Yekîtiya Ewropayê) bi jmareya 604/2013

We ji me daxwaz kirîye ku em ji we biparêzin, ji ber ku hûn mecbûr bûne bi sedeme dûketin, şer anku metirsya zirarek mezin, welatê xwe derkewin. Ew daxwaze li gor yasaya "daxwaz/ daxwaza parastina navnetewî" tê binav kirin û hûn "daxwazker" tên nas kirin. Bi giştî ji kesên ku bo parastina navnetewî daxwazê pêşkêş diken, "penaxwaz" dibêjn

**Çûnkî we lêre da daxwaz penaberî pêşkêş kirye nabee heceta vê hindê ku daxwaza we tê lêre da bê lêkollêe kirin. Êk ji yasayên Yekîtiya Ewropayê bi navê 'yasayên Dublîn proseyek damezrandye ku bi rêya vê em zelal diken ku kîjan dewlet berpîrsê lêkolîna daxwa we ye. Li gor ew yasayê, tenê welatek divêe berpîrsê lêkolîna daxwa we.**

Yasayên Dublîn li seranserê heremek cixrafi ku ji 32 welatan pêk dê, bicî divê. Di vê belavokê da em ji wan 32 welatane, welatên Dublîn dbêjn.

**Eger di vê belavokê da tiştêk hatiye nvisîn ku hûn tê nagahîjn, ji kerema xwe ji berpîrsa biprisin.**

Pêş ku em daxwaza we ya penaberîyê bikolînin, divê bê dîyar kirin ku em berpîrsê lêkolîna vê ne anku ew berpîrsyarye li ser milê welatek dî ye – em ji vê pêvajuyê re "pîroseya Dublînê" dibêjn Di pîroseya Dublînê li ser sedema daxwaza we ya penaberîyê nayête axaftin. Ev pîrose tenê berisva vê pîrsê dide ka kîjan dewlet berpîrsê lêkolîna daxwaza penaberya we ye.

**Ev belavoka zanyariyan tenê ji bo agadariya we dê pêşkêş kirin. Em bi pêşkêş kirina ev belavokê dixwazin ku zanyaryên liser proseya Dublînê ji daxwazkerên parastina navnetewî re pêşkêş bikin. Ev belavoke bi serê xwe çî maf û berpîrsyarya yasayî çê nake /liber negerît. Maf û berpîrsyariyên dewlet û şexsên bin proseya Dublînê li yasayên (Yekîtiya Ewropayê) 604/2013 da hatine tomar kirin.**

©Yekîtiya Ewropayê 2014

**Blavkirin bê kêşeye. Ji bo her çêşit bikaranîn yan çapkirina wêneyên şexsî, divê yekser ji xwedîyê mafê bikavkirinê izin bê standin.**



*Welatên Dublîn pêk tên ji 28 welatên endamên Yekîtiya Ewropayê (Hingarya (AT), Belcîka (BE), Bîlxarya (BiG), Kirwatîya (HiR), Qibris (CiY), Komara çîkê (CiZ), Danîmarka (DiK), Estunya (ET), Fenlanda (FI), Fransa (FiR), Elmanya (DE), Yewnan (EL), Mekar (HU), Îrlenda (IE), Îtalya (IT), Letûniya (LiV), Lîtwanîya (LiT), Lûksemborg (LU), Malt (MiT), Holenda (NiL), Polonya (PiL), Pirteqal (PiT), romanya (RO), silwakî (SiK), slûnî (SI), Spenî (ES), Swed (SE), Inglîz (UK)) Venîs 4 welat "grêdayî" be yasayên Dublîn (Norwec (NO), Îslend (IS), Swîsre (CiH) û Lêxtînştan (LI)).*

## "Çi maweyek dikêşîne heta ku welatê berpris liser lêkolîna daxwaza min diyar diket?" "

### "Çi maweyek dikêşîne heta ku daxwaza min tê lêkolîn kirin?"

Eger berpris bigehiştir ev encamê ku berpirsyaretîya biryardan li ser daxwaz we ya penaberyê bikewe ser mlê me, hûn dşîn di vî welatî da bminin û her lêre da daxwaz we tê bê lêkolîn kirin Paşê pêvajoya lêkolîn kirin li ser daxwaz penaberya we tê bi lez destipê biket.

Eger em bigehiştir ev encamê ku, berpirsyaretîya biryardan li ser daxwaz penaberîya we bikeve ser milê welatek, emê bxebtin ku we bi lez ji welatê berpris re bişnin. daku daxwaza penaberya we livê da bê nixandî. Gengaze gişt maweya proseya Dublînê, heta dema ku hûn ji vî welatî re tene veguhestin di rewşeka asa da **herî zêde 11 heyvan bikêşîne**. Paşî di welatê berpris da daxwaza penaberîya we tê bê nixandî. Eger hûn ji destê berpirsa brevin yan hatbine girtin,. Yan we li ser biryara veguhestina xwe ji welatek dî re daxwaza venêrîne kirbe, gengaze ku ew deme drêjtir be. Eger hûn di yek ji ew rewşane da bin, zanyariyên taybet ji were dê bêne pêşkêş kirin ku we li çarçuweya maweya taybet bi we agadar diket. Eger hûn bêne girtin, mafê weye ku bi nvîskî ji sedema girtina xwe û gengazya gazinde bûn li ser biryara girtina xwe agadar bin.



## "Welatê berpris çawa tê daxwaz min bikolîne?"



©iStockphoto / Joe Gough

Yasayê hecetên coda liser berpris bûna welatek li ser lêkolîna daxwaza we, dîyar kirine. Ew hecetene bi rêjeya ku gringin û gringya wan yasa dîyar diket, têne sebandin; ji akencî bûna yekk ji endamên malbata we di welatên Dublînê da heta vê hindê ku we nha anku dema berê vîze anku izina roniştin ji welatek Dublînê wergirtiye yan ne; yan hûn bi rewşeka yasayî anku nayasayî ji welatek dî yê Dublînê hatûçûn kirye yan lê derbas bûne yan ne.

**Eger êk ji endamên malbata we li welateke dî yê Dublîn da akincî ye, bi lez me agadar biken** . Eger hevjin, jin yan şû ferq naket yan zaroyên we li welateke dî yê Dublîn da parastina navnetewî wergirtne anku penaberin, ew welat li ser lêkolîna daxwaza we ya penaberê berpirse.

Gengaze em bixwazin ku daxwaza we di lêre da binirxînin, heta eger ew lêkolîne li gor yasa Dublînê li ser milê me nebe. Em we naşîne welatekê ku livê da mafê we yê mirovî bê binpêkirin.



## "eger ez nixwazm ji welatek dî re biçim tê çi bibe?"

Hûn dişên nerazî bûna xwe dij bi veguhestina xwe ji welatek dî re rabigehînin, û dişên ew biryarê bal dozgerî anku dadgeha navnetewî rexne biken. Herwisa hûn dşîn heta dema ku li ser daxwaz nêrîna dúbare yan venêrîne biryar nehatîye girtin, di vî welatî da bmînin.

Eger hûn ji daxwaza penabera xwe paşve biçin yan ji welateke dî yê Dublinê re biçin, gengaze ji vî welatî anku welatê berpris re bêne zivirandin.

**Li ber vê divê heta dema ku hûn daxwaza penaberyê diden, lêre da bimînin, heta ku em biryara xwe li ser welatê ku berpirsê lêkolîna daxwaz weye bigrin û/ yan daxwaza penabera we lêre da dête nirxandin.**

**Ji kerema xwe agadar bin ku eger em agadar bin ku gengaze ji ber ku hûn naxwazin ji welatek dî yê Dublin re bêne veguhestin hûn bixwazin rabiken, yan bixwazin xwe veşêrin gengaze ku ji girtîgehê (navendek sergirtî) re bêne şandin. Di vê demê da mafê weye ku we nonereka yasayî hebe û ji mavê xwe yê di b taybet mafê gazinde bûn li ser biryara girtina xwe agadar bin.**



©iStockphoto / janp013

## "Çima ji min tê daxwaz kirin ku şopa tiliyê ji min bê girtin?"

Dema ku hûn daxwaz penaberîyê diden, eger temenê we ji 14 salan zêde be tê ji we û şopa tiliyê bê wergirtin û şopa tiliyê we di binkeya zanyariyên ewropî bi navê Eurodak da tê bê tomar kirin. **Divê ku hûn di vê pêvajoyê da harîkarî biken- hûn ji alyê yasayê da berprisn ku şopa tiliyê xwe pêşkêş biken.**

Eger wîneya şopa tiliyê we baş nebe, bo mînak eger serê tilya we zirar dîti be, gengaze di pêşe rojê da dîsan şopa tiliyê ji we bê xwastin

Şopa tiliyê we di Eurodakê da tê lêkolîn kirin heta bê zelal kirin ku pêştir we daxwaz kirye yan gelo pêştir li ser sînor şopa tiliyê we hatiye tomar kirin yan ne. Ew kiryare harîkarî didete bjartina dewlata Dublîn ku berpris divê li ser lêkolîna daxwaz penaberya we.

Her wsa gengaze şopa tiliyê we gel sîstema agahîyên vîzayê (VIS), binkeya zanyarya ku agahîyên li ser vîzeyên nav herema şingênê da hatne standin



tomar diket, bê hember kirin . Eger we niha anku dema berê vîze ya welatek Dublînê wergirtibe, gengaze ji bo lêkolîna daxwaza wergirtina parastina navnetewî ji vî welatî re bêne şandin.

Paş ku we ji bo wergirtina penaberyê daxwaz pêşkêş kir, Eurodak agahîyên li ser şopa tiliyê we bo 10 salan bal xwe xwedî diket – paş 10 sala, ew agahî yene bi xwe tê ji Eurodakê bêne paqij kirin. Eger ji pêşkêş kirina daxwaza penaberiyê da hûn serkevtî bin, şopa tiliyê we di vê binkeyê da tê bimîne heta ku bixwe tê paqijkirin. Eger hûn bibine hevvelatê dewletek Dublînê, di vê demê da tê şopa tiliyê we bê paqij kirin. Şopa tiliyê we û regeza we tê Eurodakê da bê tomar kirin - nav ,wîne, rojbûn û neteweya we li binkeya Eurodakê da tomar nabe, lê gengaze ku li yek ji binkeyên agahîyên netewî bê tomar kirin.

Hûn dişên her demekê ku bixwazin agahîyên xwe ku di Eurodakê da hatne tomar kirin, bibînin. Eger bi raya we agahîyên we şaşin yan nabe bêne tomar kirin dişên ji bona serrastkirin anku paqijkirina wan , daxwazekê pêşkêş biken. **Zanyaryên li ser rayedarên berpîrsên lêkollîn (anku nêrîna ser) agahîyên we di vî welatî û rayedarên peywendîdar ku berpîrsyariya nêrîna ser parastina agahî yan li ser mlê wane, li ropela 11 ê da hatiye tomarkirin.**

Ajansa Yekîtiya Ewropayê bi navê "eu-LISA" Eurodakê rêveberî diket. Divê agahîyên we Tenê ji bo mebestên ku di yasayan da hatiye zelal kirin, bêne bikar anîn. Tenê sistema navendî ya Eurodakê agayên we tomar diket. Eger hûn di pêşe rojê da di welatek dî yê Dublînê daxwaz penaberê bden, şopa tiliyê we ji bûna piştrast kirinê tê ji vî welatî re bê şandin. Agahîyên tomarkirî di Eurodakê da nakevîte ber destê welat anku sazyên derweyê welatên Dublînê.

Ji 20ê Julaya 2015ê da, rayedar wek polîs û navenda polîsên Ewropa (Europol) dişên şopa tiliyê we binirxînin; ew kesane dişên ji bo bdest anîna agahîyên binkeya Eurodakê bi mebesta bergîrî, naskirin, û lêkolîn li ser tawanên mezin û terorîsmê daxwaz biken.

## “Li maweya ku welatê berpirs ji bo lêkolîna daxwaza penaberîya min tê bijartin, min tê çi mafek hebe?”

Eger em bigehîşine ew encamê ku, berpirsyaretya biryardan li ser daxwaz penaberya we ser milê me ye, we mafê rûniştinê di ev welatî da heye. Eger berpirsyaretya biryardan li ser daxwaz penaberya we bikeve ser milê welatek dî, heta dema veguhestinê, we mafê rûniştinê di ev welatî da heye. Eger em bigehîşine ew encamê ku, berpirsyaretya biryardan li ser daxwaz penaberya we ser milê me ye, we mafê rûniştinê di ev welatî da heta dema ku biryara destpêkî liser daxwaza penaberîya we bê derçûn, heye. Herwisa mafê we heye ku alîkarîyê madî wek rûniştgeh, xwarin û ... li gel xizmetên destpêkî yê dermanî û alîkarşyê dermanî yê acil verbigirin. Ji were derfet tê dayîn ko agahîyên li ser rewşa xwe û akincî bûna malbata xwe li welatên Dublînê da bi rewşa devekî /yan nivîskî ji mere rabgehînin û, di vî mjarê da, ezmanê xwe yê zikmakî anku ezmanên ku hûn tê digehîjn bikar bînin (yan di dema pêdivî da wergêrê devekî bikarbînin). Herwisa rûnivîseka nivîskî ji biryara veguheztina xwe ji bo welatek dî tê ji were bê pêşkêş krin. Herwisa hûn dişên ji bo bidest anîna agahîyên zêdetir gel me pêwendyê bigrin û/yan gel Rêveberîya Komîsyona Blinda Penaberan ya Neteweyê Yekbûyî (UNHCR) di vî welatî da pêwendiyê bigirin.

**Eger berpirsyaretya biryardan li ser daxwaz penaberya we bikeve ser milê welatek dî taybet bi pêvajoyên pêwendidar û bandora wan liser mafê we, tê ji were agahîyên bêtir bêne pêşkêş kirin.**



 

KMR

*"Ez li qonaxa Piroseya Dublînê da me ewe bi çi wateyeke?"*

B

Zaniyarî ji bo daxwazkerên parastina navnetewî ku li qonaxa piroseya Dublînê da ne, li gor madeya 4 ji destorên (Yekîtiya Ewropa) bi jimareya 604/2013

## Agahîyên pêwendîyê:

### Zanyariyên nîşanî û peywendya gel berpîrsê penaberan

Maahanmuuttovirasto (Xizmeta Koçberîya Fenlandê)  
PL 18, 00581 Helsinki  
+ 358 295 419 600  
Jimareya xizmetê bo ev mijarê:  
+ 358 295 419 627,  
Sêşem–Pêncşem 10–11  
[www.migri.fi](http://www.migri.fi)

### Agahîyên Rêveberîya Netewî ya Çavdêriyê (Parastina Agahîyan)

Tietosuojaaluetuettun toimisto  
(Navenda Lêkolîna Parastina Agahîyan)  
PL 800, 00521 Helsinki  
+ 358 295 666 700  
Xizmeta ragehandinê:  
+358 295 616 670,  
Dûşem–Pêncşem 9–11 û 13–15,  
Înê 9–12  
[tietosuoja@om.fi](mailto:tietosuoja@om.fi)  
[www.tietosuoja.fi](http://www.tietosuoja.fi)

### Nasnameya Kontrolkerê Eurodac û nûnerê wê/wî

Navendên pêwendîyê: Civata Netewîya Polîsî (Poliisihallitus) û Xizmetên Koçberîya Fenlanda (Maahanmuuttovirasto)

### Agahîyên Pêwendîya Rêveberîya Kontrolker

+ 358 295 480 181  
Poliisihallitus (Civata Netewîya Polîsî)  
PL 22, 00521 Helsinki  
[kirjaamo.poliisihallitus@poliisi.fi](mailto:kirjaamo.poliisihallitus@poliisi.fi)

Maahanmuuttovirasto (Xizmetên Koçberîya Fenlanda)  
PL 18, 00581 Helsinki  
+358 295 419 600  
Jimareya xizmetê bo ev mijarê:  
+358 295 419 627,  
Sêşem–Pêncşem 10–11  
[www.migri.fi](http://www.migri.fi)

Eger hûn dixwazin agahîyên xwe ku li binkeya Eurodakê da hatine qeyd kirin, bibînin, daxwaza xwe bi destî pêşkêşî binkeya polîs biken. Li vê dibe belgeyên nasnameya xwe nîşan biden. Em pêşniyar diken ku serdana hemen binkeya polîs biken ku daxwaza penaberîya we pejirandîye. Agahîyên pêwendîya navendên xizmetên polîs di malpera polîs bi nîşanîya poliisi.fi da hatiye tomar kirin.

## **Navendên pêşkêş kirina rabêjên zagonî û sazîyên alîkar**

Hûn dikarin ji navendên rabêja zagonî û nevendên dî yê pêşkêşkerê xizmetên zagonî û parêzî ku daxwaza xwe bo pêşkêş kirina xizmetên zagonî pêşkêş navenda pêşwazîyê dîken, rabêja zagonî werbigirin. Bo bidest xistina agahîyên bêtir liser rabêja zagonî, gel endamên navenda pêşwazîyê pêwendîyê bigirin.

## **Zanyariyên peywendîya Rêxistna Navnetewîya koçberîyê (IOM)**

IOM Helsinki  
Unioninkatu 13, qata 6 é  
PL 851, 00101 Helsinki  
+358 9 684 1150  
iomhelsinkiavr@iom.int  
www.iom.fi

Eger hn dixwazin xwebexşane wegerrine welatê xwe, ji navenda pêşwazîyê rabêjê werbigirin.

## **Nêziktirîn nivsîngeha heremî ya Komîsyona Bilinda Penaberan ya Neteweyê yekbûyî**

UNHCR  
Ynglingagatan 14, 6 tr  
SE-113 47 Stockholm  
Sweden  
Telefon. +46 8 457 48 80  
swest@unhcr.org



**Rajavartiolaitos**  
Gränsbevakningsväsendet  
The Finnish Border Guard